Dem hatiye! Gerdûn di nava xwe de dikele. Kîn, zikreşî û çavsofî zêde dibin. Mirov di standina ruhê birayê xwe yê mirov de huner û dahênanê dike! Ev stêrk êdî tîra hemû mirovan nake! Kuştin bûye karekî rojane û asayî. Niha tolstandin bûye diyardeya herî berçav li dinyayê. Her kes û aliyek heyfa xwe jî tiştêki dihline. Lewma dem hatiye ku êdî gerdûn bîdeng nemîne û tola xwe jî mirovan hilîne!

Gelo evin tî bîra we? Evîna yarê û dayê û welêt û mirov û xwezayê? Evîn bi hemû reng û coreyên xwe. Evîna ku agir bi dilê evindaran dixist û ew di nav komira îşqê de vedigevizandin! Evîna Melayê Cizîrî bo Selmaya ku Mela piştî xwe dida kevîrekî û helbest li ser wê dihûnandin, piştî jinan bi arî û germiya wî kevîrî nanê xwe dipêtin!. Evîna Mem û Zînê, Las û Xezalê, Siyamend û Xecê û Ferhad û Şêrinê ku di helbest û dastanên helbestvanên me de hatin nemirkirin û jî bo hetahtayê bûn malê nişîstê nû yê ku bi navê evînê bihistine lê hin bi dîtina wê şa nebûne!. Hinek kes serdema me wek serdema lezgîniyê bi nav dikin. Di vî serdemê de, bêhn li evînê hatiye çikandin. Her tişt bi lez e, zû ye, zahîrî û serve serve ye. Dem ji kûraniyê re tune, dem ji ponijîne re tune, dem ji evîn û evindariyê re tune. Teknolojî lez û lezgîniyê

dixwaze. Her tişt divê kurt be, bîlez be. Stran divê zû xwe bêjin û biqedin. Dem ji wan re jî tune. Evîn girêdayî ye, lê mirin bi das û çakûçê xwe palehiya canên windayî yê mirovan dike. Qencî zindankirî ye, lê xirabi bi çar dest û baskan şîn bi şûn û welat bi welat digere. Biratî qels dibe. Xêrkarî lawaz dibe, lê tûrikên şer hemû vebûne û pelid bi azadî digerin. Pelidên herî mezin, ango mirov, mîna seg û kûçikan ketine canê hev û goştê hev dixwin. Ev e encama veqetîn û dîrketina mirovan ji xwelîya xwe ya pêşîn, ji xwezayê, ji siruştî pak, ji çem, ji çiya, ji kulilk, ji gulan, ji dol û newalan. Mirovan bi dirêjiya hezarên salan û bi kar û kiriyarên xwe yê xirab û kurtbin, gerdûna delal û xweşik ya Xwedê wêran kir. Tew bi vî yekê jî qayil nebûn, lê rûyê xwe xistin rûyê xwezayê û şer li dijî wê ragihandin! Cîhana nazdar



Besam Mistefa

û bedew şemirandin û cîhanekê xeyalî afirandin! Lê çawa mirovan bi gotina Marx, pere afirandin û bûne kole û evdên wan, dî bibin koleyên vî cîhana ku bi destê xwe afirandin jî. Dema evîn dimire, mirin zindî dibe. Hovîtî, xwîn, term, tundî û kuştin li her derî belav dibe. Mirov bi evînê heye, lewma dema evîn namîne, mirov dibe kelûmela herî erzan û kelevajî. DAIŞ û bi dehan xwişkên wê peyda dibin û zarokên bêguneh di xew de tî kuştin... Dem hatiye! Gerdûn di nava xwe de dikele. Kîn, zikreşî û çavsofî zêde dibin. Mirov di standina ruhê birayê xwe yê mirov de huner û dahênanê dike! Ev stêrk êdî tîra hemû mirovan nake! Kuştin bûye karekî rojane û asayî. Niha tolstandin bûye diyardeya herî berçav li dinyayê. Her kes û aliyek heyfa xwe jî tiştêki dihline. Lewma dem hatiye ku êdî gerdûn bîdeng nemîne û tola xwe jî mirovan hilîne!

Piştî Kobanê û Heseke, Çi Pêwîst e?

Divê ku hemû aliyên siyasî di Rojavayê Kurdistanê de, di rêveberiya herêmê de beşdar bin, çî "Tev Dem" û çî "ENKS", û çî partiyên dîtir heger çiqas jî biçûk bin, qonax pîr hestiyar e, û em bi pêwîstî rêkeftinekê ne di navbera hêzên siyasî kurdî de, dibe ku herdû alî vegerin rêkeftina Duhokê û wê bi şeweyekî rêkeftinî aktîv bikin, jiber ku dem ne guncaw e bo pêkanîna hilbijartinan.

Rojavayê Kurdistanê di qonaxek dîrokî hestiyar re derbas dibe, miletê Kurd rastî êrişeke tund û dijwar tî, cenga hebûnê û tunebûnê ye, bûyerên vî dawiyê ku li Kobanê û li Heseke rû dan, ew nişanekê ku rêxistina DAIŞê hatiye avakirin jî bal dezgehên ewlekarî yê hin dewletên herêmî û navneteweyî bi mebesta ku pirojeyên kurdî yê netewî li Başûr û Rojavayê Kurdistanê tîk bibin, ger ev pîroje bi destê DAIŞê neyê rûxandin, tî pêşbînîkirin ku hin dewletên herêmî bi rengêki yekser derbasî Rojavayê Kurdistanê bibin da ku nehêlin Kurd azadiya xwe bidest bixin di herêmeke serbixwe de, wek dewleta Turkiyê ku serokê wê Erdogan gefa destêwerdana serbazî di Rojavayê Kurdistanê de li hêzên kurdî kir. Da'îş çî ye? Da'îş rêxistineke li ser da ramanên serekî ava bûye: 1- Ramana (El-cîhadiye Elselefîye) ango Islama tundrew ya ku li ser serjêkirinê û "xezû û sebî" tî avakirin, ku dixwaze misilmanan veegerine sine û rewîştin ku beriya nuha bi 1400 salî pî dikirin. 2- Ramana nijadperestî û şovînzîma Erebi, ku li ser wê kîna li dijî kurdan ya ku Rêjîma Ba'as li Sûriya û Iraqê li dijî kurdan dimeşandin ava bûye, û ew çanda Erûbî şovîni ya

ku di mejiyê welatiyên ereb - regez de hatiye çandin. Bi vî şeweyî rêxistina Da'îş hatiye avakirin ji Islamek tundrew û nijadperestiyek ereb bêşînor û li dijî pirojeyê kurdî bikar tî, Da'îş bi destê dezgehên ewlekarî yê dewletên herêmî hatiye avakirin û xurtkirin, lê bîngeha wê di nav civaka erebên sunne mezheb de hebû, van dezgehan ew bîngeh û ew raman li dijî Kurdan bi firehî çewisandin. Çawa Kurd wê xwe li dijî êrişên Da'îşê diparêzin? Da'îş tu carî ranaweste, wê êrişên xwe li ser hemû deverên Rojavayê Kurdistanê berdeyam bike, divê Kurd dijminê xwe baş nas bikin, niha dijminê me yê sereke Da'îş e, divê kes bi me nelîze wek gokê, divê ku em jî bibin listikvanekî serekî di Sûriya ya paşerojê de, lewra rûbirûbûna Da'îşê divê li ser gellek astan bê kirin: - Warê berevaniyê, divê ku hêzek hevbeş çê bibe, ji YPG û pêşmergên Rojava, û leşkeriya neçar bête çepandî wek hemû artêşên cîhanê, jiber ku qonax pîr dijwar û hestiyar e, û em bi pêwîstî berevaniyê ne. - Di warê ewlehiyê de, her welatiyek di ber ewlehiya Rojavayê Kurdistanê de bigiştî berpîrs e, ne tenê asayîş û polis.



Salar Salih

Xurtkirina hevpeymana civakî di nav pêkhatiyên devere yê resen de, pêwîst e û erk e, û hem jî bereya hundurî xurt dike. Divê ku hemû aliyên siyasî di Rojavayê Kurdistanê de, di rêveberiya herêmê de beşdar bin, çî "Tev Dem" û çî "ENKS", û çî partiyên dîtir heger çiqas jî biçûk bin, qonax pîr hestiyar e, û em bi pêwîstî rêkeftinekê ne di navbera hêzên siyasî kurdî de, dibe ku herdû alî vegerin rêkeftina Duhokê û wê bi şeweyekî rêkeftinî aktîv bikin, jiber ku dem ne guncaw e bo pêkanîna hilbijartinan. - Di warê siyasî de, divê ku Kurd jî listikên Opozisyonê û Rêjimê hişyar bin, devera kurdî jiber cîyopolîtîka xwe ya giring û jiber abûriya xwe ya zengîn bi petrolê û genim, lewra herdû lay jî dixwazin ku kurd tune bin û ger hebîn jî divê ku ji wan re destek bin, herweha herdû lay jî hewl didin ku bîngehên xwe li herêma kurdî tebût bikin, ev xal giring e ji kurdan re jibo ku siyaseta xwe jî dema bê re deynin, divê ku berjewendîya miletê Kurd di ser hemû tiştî re be, wek hemû welatên vî cîhanê ku berjewndiyên welatiyên xwe jî xwe re dikin armanç, û ev ya durîst e di siyaseta navnetewî de.

Gotarên Weşandî Nerînen Xwediyê Xwe Ne

(Celadet Alî Bedir-Xan) Jiyan û Berhem (1893-1951)



- Celadet Bedirxan yek ji damezrênerên pêşin yê Xoybûnê bû, û hemû çavkanî û jêderên dirokî nişan didin ku ji sala 1927-1932-an serokatiya Xoybûnê kiriye.

- "Gelî Kurdan...! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal...Şoreş û raperînên me bi çekan serneketin û ne jî gihan armancên xwe... Niha ji me tê xwestin ku em bi pênuşê, bi zanîn û rewşenbîriyê, gelê xwe hişyar bikin".

- Celadet jî pir ji wî karê xwe ne dilrast bû. Pir ji bîra Qederê xemgîn bû. Di roja avdanê de, mexabin di tîrsa xwe de derket û di wê bîrê de wer bû.


- Bi saya serê wî Kurda navên Kurdî li zarokên xwe dikirin. Bi herkesî da zanîn ku Kurd neteweyekî xwedî ziman, dirok û xak e. Xwedî şaristaniyeke dewlemend û gewre ye û di dirokê de kevnare ye.

Dilawerê Zengî
Destpêk:
Di dawîya babîlîska Nozdehan û destpêka babîlîska Bistan de, destpêka diroka hişyarbûn û bizava rizgarîxwaza neteweyî ya gelê Kurd e.

distanê qedexe bû. Emin Ali lawê Bedirxan yê mezin bû. Di nav tevgera Kurdî de ciheke girîng digirt û çavdêrê dadgeha Stenbolê bû.

seta tirkkirinê (tetrik) têt nasîrîn. Dasa ser, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajaran kirin.

Bi van gotinên pir bi akam û hêja Mir Celadet Alî Bedirxan ronaka xebatê li pêş wan penaberan vêxist û berê xebatê da pênîs û zanînê.



Çek ji destê hoz û 'eshîrên Kurdan wergirtin. Berê agirê sitemkariyê giha hemû warên jiyane (aborî, civakî, siyasî û rewşenbîrî). Xebatkarên Kurd penaber bûn û tev ji hev tarîmar bûn.

Di 26- Çiriya Pêşin- sala 1931-ê de rêdana çapkirina kovara Hawarê di bin jîmara 6224 ji wezaretê hundirî ya dewleta Sûriyê wergirt.

Li Beyrûtê sala 1929 wek parêzer xebitî û di her wê demê de û bi taybetî di 16-8-1929-an de, li bajarê Beyrûtê dest bi nivîsandina biranînê xwe kir. Di navbera 1927-1931 pir di navbera Beyrût û Şamê de diçû û dihat.

Berhemîn hêja di warê dirok, ziman û toreya Kurdî da afirandin. Folklorê Kurdî jî qûnaxa devkî derbasî qûnaxa nivîskî kirin.



Li Beyrûtê sala 1929 wek parêzer xebitî û di her wê demê de û bi taybetî di 16-8-1929-an de, li bajarê Beyrûtê dest bi nivîsandina biranînê xwe kir.

Dema şoreşa Agirî têkçû, berê wî jî ber bi Teheranê ve ket. Li ser gotina wî şah Behlewî hin kar û xebat yê dewletê lê pêşyariyê kir, lê qet wî dil nekir.

Dewlemendiya Celadet netenê di warê afirandina alfabeke Latînî û rêzimana zimanê Kurdî bû, belê Xwedîyê du dibistana bû. Dibistana pêşî Kurdaniya biware ya ku gelek nivîskarên Kurd yê penaber jê hînî rastxwendin û rastnivîsandina zimanê xwe bûn.

mezîna Rûsiya, Bîritanya û Ferensayê re û bi navînkirina -peymana reş -Saykis -Bîko - Bakurî Kurdistanê giha Turkiya, Başûrî Kurdistanê giha Îraqa nuh, Rojavayê Kurdistanê giha Sûriya û jî xwe Rojhilat tev di bin destê Îranê de ma.

Dema şoreşa Agirî têkçû, berê wî jî ber bi Teheranê ve ket. Li ser gotina wî şah Behlewî hin kar û xebat yê dewletê lê pêşyariyê kir, lê qet wî dil nekir.

Piştî hilweşîna şoreşê û têkçûna xebata çekdarî giringiyek bi girêdana civatekê jî penaber bûn li mala welatparêzê Kurd Elî Zîlfo axa- li taxa Kurdan- li bajarê Şamê bi serokatiya Mir Celadet A. Bedirxan. Di wê civîna pêşîn de Mir Celadet A. Bedirxan ev gotina xwe ya dirokî pêşkêşî wan kir û got: "Gelî Kurdan...! Gelî rewşenbîr û welatparêzên delal...Şoreş û raperînên me bi çekan serneketin û ne jî gihan armancên xwe... Niha xwestek û daxwazan nekir.

Di sala 1939-an de li ser navê xelkê Cizîrê xwe di dilê xanima wî Rewşenê bû. Celadet jî pir ji wî karê xwe ne dilrast bû.

Mijar:
Bêguman, di diroka mîletê Kurdî de, malbata Bedirxaniyan xwedî rol û kedêke bêhempa û gewre ye.

Celadet jî kaniya çand û kulturê Almaniyaniyan vedixwe, bandîra rewşenbîriya wan gelek lê dibe, nemaze diîna Basmark yê ku dixwest di riya yekbûna ziman re yekbûna Almaniyayê biparêze.



ji me tê xwestin ku em bi pênuşê, bi zanîn û rewşenbîriyê, gelê xwe hişyar bikin, û pê şerê dijminê gelê xwe bikin.

na xwe li gor wan ziman dipîva û dida ber hev. Reng û darvin nuh û serbiwê li alfabe ya xwe kir. Bi zanebûn taybetmendiyek da alfabe ya xwe ya nuh û bi pênc ziman belav kir.

biryara Xoybûnê û bi piştgirî û alîkariya Celadet Komela (Civata arîkariyê ji bona belagazên Kurd li Cizîrê) hat damezrandin. Ev ê Komelê armanc û sedemê çêbûna xwe di kovara (Hawarê) hejmar: 2 ya ko di 1-Hizîranê 1932an de hatiye weşandin, di de diyarkirin.

Di sala 1937 de li gor biryara Xoybûnê û bi piştgirî û alîkariya Celadet li bajarê Amûdê (Nadî Ciwan Kurd -Amûde) hat damezrandin. Di 1-ê Nisana 1942an de Mir Celadet Alî Bedirxan hejmarê pêşî ji kovara Ronahî belav kir.

Ji sala 1934-1936-an de Celadet zimanê Fîrensizî li dibistana pişê li bajarê Şamê daye. Di sala 1935-an de Bi Rewşen Bedirxan re hevjin biye û keçek bi navê Sinem1938 û çend berhemên hêja belav kirin ji wan:

li rewş û awayê kar û xebat, ziman û wêje, serhawe û berhawên Kurdî dimeyzand. Hostê çêkirina peyva nûjen bû.

Xebata vî ronakbîrî pir berfireh û ber biçav bû, rehên xwe bera civaka Kurdî dabû. Ji hêlekê de, bibû mak û dibistanêke serbiwê ji hemû rewşenbîr û nivîskarên re, û ji hêlekê din de, Xudan pîmar bû.

Nêrevan, Herekolê Azîzan, Xeburgûbêz, Stranbêjê Jêliyan, Stranvan, Şiretbêj, Çirokbêj, Şevger, Seydayê Gerok, memosteyê Gerok, Hawar, Cemşîd, Newîn, Dilistan, Şebistan, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sinemsanê, Koçerê Botan, Yekî Vexendî, Xwedîyê Hawarê, Nivîsanoka Hawarê, Taiûzparêz, C.A.B. Ronahî, Xwedîyê Ronahî... dibe hin navdînan jî hebin.



lawek bi navê Cemşîd 1939 Xwedê dayê. Di sala 1939-an de li dezgeha Rêcê-ya tûtînê wek parêzer û serokê çavdêrî kar kirye.

çend berhemên hêja belav kirin ji wan: -Rêzana Elfabeya Kurdî. Mir Herekol Azîzan. Çapxana Tereqî. Şam: 1932. Kurdî, Frensizî, Turkî, Erebbî û Farisî. Bist rûpel in. H:1.

Di sala 1947-an de li ser navê xelkê Cizîrê xwe di dilê xanima wî Rewşenê bû. Celadet jî pir ji wî karê xwe ne dilrast bû.

-Rûpelînen Elfabê. -Biyêşa Pêxember(Mewlûda Nebî) Osman Efendî. Bi Kurdîya dumilî, bi dibaca Celadet. Çapxana Tereqî, Şam. 1933. Çel û şeş rûpel e. H:4.

serencam: Mirovê gewre xwedî rol û bandûreke gewre ye. Bi xwendevanê xwe re rastgo û xwedî hestekî nazîk û pîr sade ye. Bi erk û bepirsiyari

-Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re. bi destê Rewşen Bedirxan hat wergerandin bo zimanê Erebbî min jî çap û belav kir. -Ji Mesela Kurdistanê. Min wergerand zimanê Erebbî û belav kir. Sala: 1999- Hewlêr. Ji weşanê rojnama Medya. - Gramera Zimanê Kurdmançî. Celadet û Rojê Lîsko. Wergerand: Dilawerê Zengî. Digel çend mamosteyan. 1991. Şam. -Fêrhega Kurdî-Kurdî. Çapxana Avesta. Stenbol-2009.

DÎTIN



Nûbar Hesen

Ger rojekê
te dilê min vekir
û te wêneya xwe
ser diwarê dil
kolayî dît
kêfxweş nebe...
û ger rojekê
ser dilopê xwîna min
xwend navê xwe
dîsa nekene
û kêfxweş nebe...
lê...
ku ti li canê min gerayî
û te nedît
hingî kêfxweş bibe
û zanibe
rê girtî ye
û berê xwe daye te

Çi dema ez te
Dibînim
Dixwazim te
Himêz bikim
Û binefşek piçûûûûûk
Ji lêva te biçinim
Lê li ber cadwa çavê te
Matmayî diminim
Û tenê karim
Bejna xwe bitewînim



Siya Dêliyê
Ekrem Osman

Min zarotiya xwe bi xwe re mezin
dikir
Min ew dida ber bayê hemû
demsalan
Di singên keçin ciwan de, ew
dinuxumand
Min ew li her deverê digerland
Zarotiya min ez bi xwe re biçûk
dikirim
Li bin dêlya tirî
Û pitpita dêya min
Li çûn û hatina malên cîranan
Ez vedigerandim
Min xwest lê vegerim
Wê nexwest...!
Ne pitpita dêya te ma ye
Ne siya dêlyan ma ye
Ne jî war ew war e.
Ma tu nizani ku çî û war jî ji mirov
şerm dikan.



Ji Bo Perwer
Şivan
İdrîs Hac Qasim

Diyar dikim ji bo te

ey Şivanê bi hiner
Evan rist û helbestan
Hêvî dikim ji te ez
Wî deng û awazê xwe
Bera zimminê bide

Rastî jî diyar bibe
Wênayên qehremana
Bera durîst bingeh be
Bi ronak û şemal be
Her mana ayîndê be

Ofîn û axîna dil
Şoreşa tey dem dirêj
Çima wilo bê dengî
Kurdistan vala dibe
Şalê mimê bibirin

Dakev meydanê bi hêz
Li kumêt tu bib siwar
Bişkin destê bi qirêj
Bera koçber veşerî
Berhemê nerastiyê

De rabe Şivanê Kurd
Her şoreşê Kurdistan
Bi çeka deng û muzîk
Dakev hest û damara
Dîsa merş û sirûda

Li ser canê her serwer
ew fixanên bi keser
bighîn kesêd penaber
deşt û çîyan seranser

hemû êş û azara
bibe çira neçara
tîrêjê serê cara
her sibeh û êvara
li qûç û him kenara

berdî çol û beyara
ne rawestî tu cara
li gel van dos û yara
dibe mirga keftara
ey hozanê dildara

bişkin pêla neyara
bighê mîrg û buhara
xezêba sitimkara
rengîn bikin avdara
wêraniya bajara

dîsa wek carê berê
tu yek bû jî wê berê
me bighîn xêza serê
li ser kîn û keserê
bik diyarî dilberê



Ez Rabûm û
Ketim Mendêwar

Ez bilind bûm min xwest
çim tewafa heyv û stêra
Min bi xwe girt û serî tewand jî
Xwedê re
Min xwest ez rûyê rojê ramûsim
û tiştêkî bikim ji dinê re
Ti çav nehata girîyan
ku ne hêstirêd min vêre
Ez li xweşiyê negeriyam
Li sing û bera neçeriyam
Û nalim bi hemû janêd xelkê re.

Ez bûm gopalê çend kala
Ez bûm dîsa çend pala
Ez bûm gemmê çend çala
Û çend li nav lepêd mirinê de
min ava jîyanê li gêra.

Ez bûm çirayê hemû şeva
Ez bûm pariyê hemû deva
Min negot min kir ji kê re.

Bi qenci nehate naskirin
Li ti ciya nehate behskirin
Û hina kenê xwe bi min kirin
Hêj min negot keda min çû bi avê
re.

Lê bi xwe hisiyam
Li xwe veximiyam
Li ser xwe giriyam
Min nizani zeman
ji min di hate dizin
Diniya bi min dikenî
Nû ketim pey şopa roja min
xwe wînda kir li nava toza demê
re.

Ketim tekoşîna jinê ,
Belengaziyê birin kirim
Axê ez bihin kirim,
Û kesî bi destê min negirt
Lê her nebûme dost bi mirin ê re
Heta min xweş diniya nas kir
bûme henek ji demê re
Bûme henek ji demê re.

Hate Cengê



Nûşîn Bâcirmanî

Vê dilberê dil herifand
Yek rim ji çava lê kişand
yekser bi ar wê laş kewand
çibkim ji van çavên xedar

çav hatne cengê b,dav û tîr
ê ku xwe girt ew bûye mîr
naçim tu carî ji hiş û bîr
mîr im jî dêman re siwar

dilber şevêk damin û çû
çilo revand dil birye kû
tenê dizanim roj e rû
dil vegeerê dilber hewar!!

nadim tu car dil yê min e
zulfa ji nû kir çin çin e
rim werkirin ev yar kin e
ew hate cengê bê hedar

yek maç ji lîvê qet neda
çibkim di cengê hey xweda
wê dil dixwest mi can ji da
ji nû dida min bax û dar

lêva te meyxana min e
derya te yarê bê bin e
hahoo.. delalê ev çin e
ji reh birim ew bûye war

dengê te xef hat roj hîlat
ronya te dabû nav welat
şewqê dîda birc û xelat
ji wî devî mey hate xwar

Sîwana
Seqlanê
Mema Li
Pirtûkxane-
neya Kurdî
Zêde Bû

Dîwana yekem a helbestvan Welat
Seyid İsmanîl ji hêla çapxaneyê
Sîmav li bajarê Qamişlo derket.
Dîwana ku pêşgotina wê nivîskarê
Berzo Mehmedî bi ber- f i r e h i



nivîsiye, û gelek mijarê dîwanê
tê de şirove kirine ji (80)ê rûpeli
pêk ahtîye.
Diyariya wê bo xort û keçan kurda,
xwendevanên hêja, Dicla xemîndar,
Mezra zêrin, Seqlanê meman,
Mamê min (Mihemedê Diclawî),
Dost û hevalên partiya Pêşverû,
canfida û mîrxasên Der'a û Hums,
İdilb û Dêra Zorê, û dawî diyarî bo
mîrê helbesta kurdî Ceger Xwîn
dike.
Dîwan jî 53ê helbestan pêk tî, di
navbera evîn, kesayet, ciwak, we-
latperwerî, netew, û siyasête we
hatîye dabeşkirin.
(Di helbesta "Evîn" de dibêje:
Evîna min zêndo ye ew
Meya jinê
Dinoşim
Ji du lîvên te şêrîne

Evîna min helbeste
Nûjen dibê
Di nav mîja awazên te))
Navê Helbestvan: Welat.
Navê Dîwanê: Seqlanê Mema.
Dîwana Yekem: çapa Yekem.
Çih û Dema çapkirinê: Çih Qamişlo,
Sala çapkirinê 2015.
Jimare -1-
Çapxane: Sîmav - Qamişlo.
Wêneya çapê: Şîrîn Amîdî

Qêrîna Kobanî



Çimen Mûrad

Car di di rojekî bê deng dedojehê
dergehê xwe bi teqînê vekir,
qêrîn bi asmanê şewitî ket,
hovên reş xemlandî,
dilan di bihûsta wêrankirî de girtin,
û bi xwînê kel axa tîhbuyî av
dan,
zarokên bê guneş di hemezê
dayikên kelogirî de cemidin,
û bavên bêzar bi toza hilweşayî
fetisîn,
ferman hêjmara xwe guherî,
û zeman pelek bi xwînê neqandî li
dîroka hejariye zêde kir,
ey hewar,
ey hewar kengî ferman bidawî
dibin,
da çavên dayikên birîndar zuha
bibin,
çavên dayikên birîndar zuha bibin

KOBANÊ



Kobana min tu agirî Tu şildaxî
navemirî Bi navê xwe tu azadî te
dîroka Me çêkirî Tu bû navê herî
balkêş Te dijminêk bingor kirî
Kobana min tu jiyarî Te navê xwe
pîroz kirî Di meydana şer û cenga
tu bû navek zindî kirî Kobana min
te qelen da Şehîdên me çûn bê girî
Ji pêşmerge û şervana Hemî yek in
di sengerî Welatê me yek parçe ye
Nabê biminê dest gurî Saykis Biko
te dawî kir Sinorek nû te çêkirî

Keşene bi simbêlin dirêj

Riyad Salih Al Husên
ji Erebi: Fewaz Ebdê

Jinê got:
Ez dixwazim, li ser heyvê,
Li gel zeviyek genim, darekê,
bizinekê û
zilamekî ez jê hez dikim, bijîm!
Mendal got:
Ez çûkekî dixwazim, da wî bi
xwarin bikim!
Pisîkekê, da pê re bilêzim!
Deftereke wênekirinê û pênûsin
rengîn
Da pisîkê li rex çûk wêne bi-
kim!
Zilam got:
Ez dixwazim kar bikim, şû bi-
kim, serxweş bibim û herim
sinemê!
Darê got:
Ez dixwazim kesek bimînim!
Çem got: Ez dixwazim qet ne

rawestim!
Û dûv re... dûv re
Mirovin bêdeng hatin;
keşene bi cilin reş, û simbêlin
dirêj
Laşê dadperweriyê bi kevirên
yasan şuştin û
Tev birin zindanê...!

Azadî

Ti sude ji qêrîne tune
Wekî deng ji zindana dev der-
nakeve!
Ti sude ji girî tune
Wekî desmal tîra paqijkirina
hêsiran nake!
Ti sude ji rê tune



Wekî nig di qeydan de ne!
Ti sude ji cil û bergan tune
Wekî laş tîji kêr e!
Ti sude ji evîniyê tune
Wekî ramûsan tewanbariyêke
yasayî ye giran e!
Ti sude ji nan tune
Wekî wê dil birçî bimine!
Ti sude ji min tune
Wekî ez ê bê hêvî bimirim!
Û sude ji wan tevan heye
Çaxê em tiryê azadîyê bicûn.

Di Mem û Zîn ê De Neteweperestiya Kurd

Rewşa politik a dijwar, ne tenê li lêkolînê edebî, dîrokî û etnolojî, her wiha bandorê ziman û çanda Kurdî jî dîke. Dabeşkirina Kurdistanê nav çend welatan, durbûn aniye pê û çanda Kurdî jî perçe kiriye, xet xistiye navê. Ji bo berxwedana gelê Kurd qels bikeve, karakterên netewî tîk bibin, bi aşimilê jî holê rakin û bikin kole, çî xirabiyên pêwîst hene dihênin pê.

Li dijî vî siyaseta hov, Kurda her dem berxwe da û serî hilda. Ji sedsala 19an, ber bi ya 20an, tevgera netewî rengêk politik girt û avakirina dewletek netewî bû yek ji armancên bingehîn. Kurdayetî edî bû motora tevgera netewî a esasî. Helbestvan û ronakbîrê Kurd Ehmedê Xanî (1650-1707) mirovê yekem e ku bingeha neteweperestiya Kurd daniye. Wî, bi destana Mem û Zîn ê rewşa Kurdistanê bi şeweyek politik analîz kir, ji bo azadî û avakirina dewletek netewî bi navê Kurdistan, bang li xelkê kir.

Xanî bala gelek lêkolînê û nivîskaran kişandiye. Dema qala roja ji dayikbûn û wefata wî tê kirin, li ser heman rojê li hev nakin. Ev yek bo nivîsina Mem û Zînê jî derbas dibe.

Xanî bersiva pirsê di Mem û Zîn de dide. Sala 1061 (2652), dibêje. Li gorî salnama miladî di 1650-1651 hatiye dinyê. Nivîsina Mem û Zînê di 44 saliya xwe de dawî aniye (2653). Li gorî miladî dibe 1695. Aladdin Sucadî li ser sala wefatê lêkolîn kiriye û "Di diroka Edebiyata Kurdî" de dibêje ku Xanî 57 salan jiyaye û di sala 1706-

1707 de wefat kiriye. Xanî, bi Turkî, Erebi û Farisî baş zanibû. Lê wî berhemên xwe bi Kurdî nivîsî. Kurbûn û bedewbûna Kurdî raxist ber çavan û pê berhemên giranbûha afirand. Bi bilindiya helbestê, mezinbûna hunera xwe eşkere kir. Weke ronakbîr û bi helwesta rêvebirekî, dîtina xwe li ser navê gel, bi riya nivîsînê ragihand. Di diroka edebiyata Kurdî de, nîrx û cihê berhemên wî, nikare lê mêzênê bikeve, giranbûha ne. Sê kitêbên hejra hiştine: Nûbara Biçukan, Aqîda Îmanê, Mem û Zîn.

Nivîsina Nûbara Biçukan 1094 (Hicrî) de bi dawî hatiye. Ferhengê Erebi-Kurdî, bi şeweyê helbestê nivîsî ye. Ji 14 beşan pêk tê û giringiya başbûn û fêrbûnê jî xwe re dike mijar. Di dema fêrkirî de, sebir, zanabûn û berdewama kar ji mamosteyan re tewsiye dike. Xanî, nîrxêk mezin dida zarokan. Ji rêvebîrên wê demê bêhtir, hêviya xwe bi neslên nû girêdabû. Li gorî Xanî, neslê nû bi xwendin û perwerdê de berê Kurda bida rizgarî û felatê.

Eqîda Îmanê jî 73 risteyan pêk tê. Erebi, bi hatina Îslamê re ne tenê li bawerî, her wiha li adet û toreyan jî tesîra pîralî kir. Di demêk wiha de ku, nivîsina erebi di nava gelek milletan de populer bû, nivîskarek Kurd jî bi Erebi dinivîsî, Xanî, qaideyên Îmanê bi Kurdî şirove kir. Giringiya wê, ji nivîsina bi Kurdî tê. Bi nivîsina Eqîda Îmanê îspat û îqna kir ku, bi Kurdî jî şirovekirina Îslamê dibe, ne guneh e, baştir tê fêmkirin.



Gabar Çiyan

Di Edebiyata Kurdî de berhema herî mezin û giranbûha, Mem û Zîn e. Û Ehmedê Xanî jî, bo du sedeman di Dîroka Edebiyata Kurdî de helbestvan û revebîrê herî mezin e:

Mem û Zîn, li ser esasê qaide û şertê destana klasik a rojhilat nivîsî. Berhem li ser çirokek Kurdî ava kir û bi vî, zimanê Kurdî anî mustewa zimanên rojhilat.

Xanî, di diroka Kurda de, kesê yekem ku, neteweperestiya Kurd, formule û zelal kiriye. Di Mem û Zînê de, sedema rewşa xirap li welêt, bi perçekirina Kurdistanê, di nav Sefewî û Osmanîyan de, girê dide. Di vî rewşa xirab de jî, Kurd karin berxwe bidin û dewleta xwe a netewî ava bikin. Tenê sê tişt dikare Kurda bighêjine felatê, gotiye:

Yekîti, bihêzbûn û însaneti (qencî).

Nivîsa jor, beşek ji analîza nivîskar Ferhat Şakelî bû. Lêkolîna wî derbarê "Mem û Zînê de Neteweperestiya Kurd" tîra xwe balkêş e. Kitêba wî di nav weşanên Dozê, li Istanbulê bi turkî derketibû. Ji bo kesên dixwazin Ehmedê Xanî baştir nas bikin, çavkaniyek bi nîrx e.



Ber Bi Civaka Hişyar Ve

Alan Pîr Mem

Na bi carekê re, hene yên ku ji xwe re kar dikin û pera ji Elmana bêhtir didn hev û dikan û karê wanî bi wan ve taybet heye û hene yên ku ji xwe re li dibistan û bêhtir li zanîngeha dixwînin, fêrî ziman bûne, û dixwînin wek wan wekû hemû kesên din yên ku ber bi wan welatan ve tên ji bo kar û xwendinê

Çûn û hatin û tevlîbûna nav xelkên biyan, nav zane û nezanan, serdan û çûn û tevlîbûna dibistan û zanîngeh û akadîmiya û deverên peyxam û zanîne çî li hundirê welêt û vî dawiyê û bi pirranî li derveyê welêt hişt ku civak edî bi xwe û bi kesayeta xwe hest bike, xwe bi qat û xelk û çêkirê xwe nas bike, bi hezarên mişext û koçber û penaberan li deverên pîr û rengereng ji cihanê û li welatên herêmênî nêzik ji ciwan û xortên me hiştin ku edî li tenişt zehmetiyên ku tê re derbas dibin yên ku merov anîha bi tevahî nikare bihejmêre, çavên wan bi ser cihanê ve vebe û xwe bi himberhêna milletên din bibînin, wê hin bibêjin , mane tev de penaber û ji dever û cihên xwe mişext û koçber bûne, rast e lê di ser wilo re jî wan dest danên li ser dest û wilo neman bi tenê ku gilî û gazinan bikin, lê belê karkirin li Hewlêrê û li Îstênbûlê û li bajarên din jî ji Turkyayê û ji Kurdistana başûr û yên ku ji xwe berê li

Libnanê ne wan jî ji xwe re kar dîtin û xebitîn û pere dane hev û li wan welatan wekû niştecihê wê bûne xwedî mal û kar meriv jî .

Û ji xwe îcarê gava em berê xwe edî bidin Ewropa û welatên ku kurd lê di van çar pênc salên dawî de niştecih bûne û bi taybet li Elmaniayê, welatê ku bi hezarên kurda di nava civaka xwe de xwedî dike ji bêhtir ji heftê salî û heyânî niha ku kurd wê wekû heval û hevalbend ji kurd û kurdistaniya mere dibînin, îcarê nîza rastiya vî heyânî kîjan radeyê heye , lê belê babet ji xwe ne eve , bêhtir ku min dixwest ez balkêşiyê bînim ser wê yekê, bê edî kurd li Ewropa çî dikin, ne tenê penaber in, û ne tenê koçber in û dilê xelkê bi wan dişewite û guneh û reben in.

Na bi carekê re, hene yên ku ji xwe re kar dikin û pera ji Elmana bêhtir didn hev û dikan û karê wanî bi wan ve taybet heye û hene yên ku ji xwe re li dibistan û bêhtir li zanîngeha dixwînin, fêrî ziman bûne,

û dixwînin wek wan wekû hemû kesên din yên ku ber bi wan welatan ve tên ji bo kar û xwendinê. û li Ewropa jî her wiha niştecih bûne û bûne hemwelatîyê wê û mafên wan wekû mafê xelkê cihe û hemû jî li ber yase yê yek in, ya kesî li ser ya ên din bi carekê re tine ye.

Li Ewropa mal vekirine, zarokên wan li wir çêbûne, mezin bûne, dîsa jî ne zimanê xwe ji bîr kirine, û ne bûne Ewropî û bêhtir Elman, ji ber ku bi pirranî li vî wealtî kurd jî her çar perçeyan dimînin.

Îcarê nîza, min bi xwe tişteki wan û penabertiyê hêji di nav hev de nedîtiye, wekû hemû biyanên din li wan welatan dijî, ber dikin, dixwînin, dibînin bijîşk, berfedêr, endezyar, firoşyar, û her tişt .

Îcarê bi hêviya ku edî rijekê vezerin welatê xwe û tiştê ku ji wan welatên pêşketî fêr bûne bi xwe re bînin welatê xwe û pê de pê de edî ber bi pêşerojê ve biçin .

Divê Dest bi Şoreşa Geşedana Zimanê Kurdî bibe



Merwan Berekat

Eger tu bixwezî nasnameya netewî ya mirovekî winda bike, û ew di neteweya te de were helandin, berî her tişteki zimanê wî, bi wî bide jibîrkirin, û zimanê xwe bike zimanê mal û danûstandina hemû warên jiyana wî. Ev rastîyeke dîrokî ye.

Belê eger mirov li diroka mirovahiyê vegere, û wê baş raçav bike, dê bibîne, ku gelek millet hebûn, lê roja îroyîn ne ew, ne zimanê wan û ne jî bermayên wan mane, û hin jî, hejmarîne pir hindik û belawela mane. Ew milletan ne bi şer, ceng û nexweşiyên hatin tunekirin, lê belê sedema serekîn ew bû, ku ew li zimanê xwe xwedî derneketin û neparastin. Wan zimanê milletine din bikar anîn, û bi demê re ew di netewa wan zimanan de hatin helandin. Bêguman, di vî warî de, hertim rola destlatdarî û dagîrkeriyê hebûye. Tevlî ku hewildana şer û tunekirina zimanan, tucarî nakeve xizmeta avakirina şaristaniya mirovahiyê, lê mixabin di destpêka dîrokê de, û ta roja îro ev karê ne mirovane ji aliyê regezperest û şûfenîzman ve tê kirin.

Ji sed salan de dijmin û dagîrkerên Kurd û Kurdistanê bê rawestan, bi rêbaz û pirojeyên curbecur hewil dan û hin jî, berdevam in, ku zimanê kurdî winda û dêris bikin. Lê xewnên wan yên şûfen û nijadperest her û her tîk diçin. Ji ber ku ronakbîr, rewşenbîr, zimanperwer, û hişmendên kurdan, ji ber parastin û reseniya zimanê Kurdî de kedeke bê hempa kirine, û ta astekê ew bi demê re nûjen jî kirine. Ew jî cihê serbilindî û şanaziya gelê Kurd e. Û Ji erkê her Kurdekî ye, ku geweremirovên kurd ên ku di riya pêşxistina zimanê Kurd de xebateke payebilind kirine wan ji bîr nekin.

Zimanê kurdî yek ji zimanên kevna e, û di pêvajoya diroka xwe de, û nemaze di serdema Mîdî û berî wê jî ya Mîtanî de, wî pir şaxên zanistê yên wan serdeman ji memikên xwe yên zimanî mêjandine. Ne

tenê wisa, lê belê di wan serdeman de, ew wek zimanekî cihanî jî, dihate naskirin.

Ji aliyekî din ve, zimanê kurdî bandorên xwe yên zimanî, li zimanên, ku bi wî re bûne hevsiyor kirine, û ta roja îroyîn jî, pir ji bêjeyên Kurdî cihê xwe di ferhengên wan zimanan de girtine, û ewan bi kar tên wek zimanê Erebi, Tirkî, Farisî, û her weha di hin zimanên din de jî, wek Îngilîzî, Yûnanî.. û hwd. Lê.. ji ber ku zimanê kurdî ji sed salan de, nebûye zimanê destlatdariyê û ew ji qadên fêrkirin, perwerdekirin û hemû warên zanistê dûr maye, mirov dikare bêje, ku ew bi gavine pir fireh li baş demê maye. Ji ber wê jî, zor girîng û pêwîst e, ku kar û xebateke pir mezin û ji hemî aliyan de, ji bo vejîn, nûjenkirin, serastkirin û astabilindkirina wî were kirin.

Bêguman, dema ku em dibêjin ew li paş demê maye, û divê were vejandin, ew netê wateya ku zimanê kurdî hatiye pişfandin, û divê ji nû ve, were vejandin, lê belê, mebest ew e, ku em bîkaribin wî bikin zimanê hemû şaxên zanistê yên vî demê, û wî bigînin asta zimanên serdema niha.

Ma gelo em ê çawa karibin bi şewakî zanistî ji bo pêşxistina zimanê kurdî bixebitin, û pirsgerîkan çareser bikin?

- Gava yekem ew e, ku li ser asta Kurdistanê konfiranseke fireh ji zimanzan û pisporan were lidarxistin, û dê serkeftî û berencam be, eger beşdarên wê ji hemû zaravayên zimanê kurdî bin.

Di wê konfiransê de komit werin avakirin û kar were hilpesartin, û dê erênî be, eger ew bibe cihê biryarstandinê. Dê baş û pêşketî be, eger endamên beşdarî konfiransê pitirî zamanekî zanibin, û nemaze zimanên Erebi, Farisî, Tirkî û Îngilîzî, ji ber ku sê zimanên pêşin badora wan baş li zimanê Kurdî bûye, û Îngilîzî jî, wek zimanekî cihanî bandora wî li pira-

niya zimanên cihanê heye.

- Zor pêwîst e, ku komelege-

ke zimanê Kurdî were avakirin, û ew bibe lêvegêra karûbarên zimanê Kurdî, û nemaze di warên danîna tîrman, amadekirina ferhengên bi şeweyekî zanistî û çareserkirina pirsgerîk û serastkirina rêzîmên.

- Hemû zimanên ku di dema niha de li cihanê hene, belkî ew jî wek zimanê Kurdî pîrzarav bin, lê bi yek abêyê (alfabe) tîrman nivîsandin, tenê zimanê Kurdî bi du abêyan tîrman nivîsandin. Di jiyana zimanê Kurdî de, ev pirsgerîkeke mezin e, û belkî di siberojê de, ew bibe cihê metirsîn û nakokiyê mezintir, ji ber wê jî, hem ji stenderda zimanê Kurdî, û hem jî, ji pêşeroja me kurdan re, girîng û pêwîst e, ku çarek ji vî pirsê re were danîn.

- Di van çend salan de, hin saziyên fêrkirina zimanê Kurdî (Kurmancî), li Bakur û li Rojavayê Kurdistanê hatine damezrandin, û her yekê jî wan metroyaline taybet bi xwe, amade kirine. Bêguman ew ta astekê xebatek erênî û sûdar e, lê metroyalên ku ji bo perwerdeyê hatine amadekirin ewan, ne bi şewakî zanistî ne, ji ber ku ew ji aliyê kesan ve, hatine amadekirin, belkî ew ne pispor bin jî. Ji aliyekî din ve, hevkeyî di navbera wan saziyan de tune, ji ber ku her yek ji wan gêrdayî, yan jî nêzikî partiyeke kurdî ye.

Ta ku jiyana zimanê Kurdî derbasî geşedaneke raşteqînî bibe, û nemaze di warê perwerdekirî de, divê danîna metroyalan nebe dilê biryarên siyasî. Ya rast ew e, ku ew ji aliyê kesên pispor ve, werin amadekirin.

Ev hin ji gavên ku pêwîst e dereng nemînin, û zor girîng e, ku em dest bi şoreşa geşedan, pêşvebirin û lêxwedîderketina zimanê xwe yê resen û xwedî dirok bikin.

Belê... Ziman jiyane, divê em li tenduristiya jiyana xwe, xwedî derkevin.

Ji Qamişlo... Silav Bo Jiyanê...!



Zûbêj

Sê dîk û sê mirîşk, Sê dîkê nig
bi çîk, Sê mirîşkên zemberîşk



Mamik???

- Kûpikê tije savar.. Ez wî dernexim dikim nayê xwar?!
- Çar bira li ser bîrekê..Dikin çîrevîrekê?!
- Hespê boz li meydanê kir toz?!
- Li jor qelaç, li jêr qelaç, di ortê de yekî gelac ?!

Bersiva hejmarê bûrî :Çente – Aş - Tiveng



Ferîdon: Strana Kobanî

Ji Şewata Dilê Min Hat

Pend û şîretên kurdî

- Aqilê xelkê hingilê meşkê
- Xezûrê bûkan serê sûkan
- Erê reşe lê mewîjek xweşe
- Bilûra ber ga ye, çira ber kwîra ye
- Margestî ji xuşîna werîs ditirsî
- Bext reş li emir kîna rast tîn
- Fira mirîşkê kadîn e.
- Beza pisikê kulîne
- Kevrê havîna bavê bin kulîna
- Dizê bîstana xuya dibin zivîstana

Kurdî Xweş e

- Nêberdan - pêveman
- Netebîfî
- Nîşan
- Noker
- operasyonên leşkerî
- Paşveçûn
- Pêrabûn
- Pêşber - xwebexş
- pêşbînî
- Pêşbinkirî
- Pêşbîrî
- Pêşenûs - Yadname
- Pêşinde

Keçek biçûk bûm ji dilê Kobanî / Hêl di mî'd nema bikim bazdanê Dijminê Gawir gelek nêzik e / Tirsim min bigre û serê min jêke Ax Kobanî, ax Kobanî.. Bi qurbanî Bi van çend malikên bi şewat hunermedê kurd Ferîdon ku bi eslê xwe ji bajarê Amûdê ye dest bi strana xwe li ser Kobanî dîke, strana ku amade kiriye, û awazên wê ji danîne, têt jê re çêkiriye, lê ta niha nebûye Kilip, û ew bi hêvî ye ku di demek nêz de wê yekê pêk bîne. Strana Kobanî ku li ser zimanê keçek biçûk hatiye hûnandin, bi giştî li ser êş û azarê xelkên bajêr e, di heman demê de daxwaza yekîtiyê jî tê de heye, û jibîr nake ku behsa dijminê bê ol û kesên jê re piştgir û alîkar

in jî bike: Dijminê bê ol xwîn kiriye gol / Jê re lê didin zîra û dahol Kes ji jiyanê bi me ve nayê / Xwîna zaroka weke çema ye. Di dawiyê de rîya xelas û çareseriyê ji kurdan re eşkere dîke û dibêje eger yekîtiyek di navbera Kurdan tune be, wê hemû bajarên kurdan bînpê û dagîr bibin: Îro Kobanî û sib serê Kanê / Û paşê Qamişlo dayika cihanê Wê xwîn birje û dilê min tije / Heger nebin yek ve roja hanê Hunermend Ferîdon Li ser jiyana xwe a hunerî ji rojnameya Bûyer re dibêje :” Di sala 1976, ez heft salî bûm, min beşdarî komeke filiklorî de kir, di 83an de li ber destê hunermendê mezin Se’îd Yûsif fêrî mûzîkê

bû”. Ferîdon berdewam kir:” Navdartirîn stranê min a “Ne Heyat e” bû. Û wê dawiyê min strana “ li wê kerbelê.. li wê çolê” jî da hunermed Îsa Brahim, wê jî li nav millet baş deng veda. Gelek hunermendan mîna Ebdilqadir Silêman, Ehmed Silêman, I’ tidal, û hunermend şad ji helbestê min stran gotine. Min bawername ji amojgeha D. Ezîz Zaza wegirtiye, min bêtir ji 50 şagirtî bê beramber fêrî mûzîk û note kirine”. Li ser strana Kobanî Ferîdon wisa got:” Biryara strana Kobanî ji şewata dilê min li ser zarokên Kurd ku li ser destê tîrorê hatin serjêkirin hat, lewre gotinên wê li ser zimanê zaroka biçûk bû.. bi giştî ez wê şeweyê stranê ji ya şoreşgerî çêtir dibînim”.

Peyva wendayî

S	E	R	Ê	K	A	N	Î	E
D	Ê	R	I	K	R	O	K	F
J	Ç	E	L	A	X	A	O	R
H	E	S	E	K	Ê	A	B	Î
Ê	D	Û	M	A	V	A	A	N
O	L	Ş	I	M	A	Q	N	R
Î	S	Ê	B	R	I	D	Ê	A
T	I	R	B	E	S	P	Î	C
G	I	R	Ê	S	I	P	Î	O

Dêrik, çelaxa, tirbespî, qamişlo, amûdê, dirbêsî, hesekê, serêkanî, kobanê, girê sipî, efrîn, raco.

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

ASOYÎ:

- 1.Am, navê rojnameyê.
- 2.Endamekî laş, wekhev.
- 3.Wî dîtî kir, kîjan der (vajî).
- 4.Erê (bi zimanekî din), problem.
- 5.Ji cem xwe gihande yekî din, dijwateya dûr.
- 6.Ji ajelên jehirdar e, ehengeke li Kobanê şehîd bû (vajî).
- 7.Li rojhilatê qamişlo ne, roja dawî ji heftiyê.
- 8.Çîroka evînî ya herî navdar li ba kurdan.

STÛNÎ:

- 1.Keçam.
- 2.Ajelek e, limêja dawî di rojê de (vajî).
- 3.Wekhev, navekî keçan (vajî).
- 4.Nû çêbû, Ji cem xwe gihande yekî din(vajî), li ser mast çêdibe.
- 5.Endamekî laş e, evîndaa Mem (vajî).
- 6.Komek şervan.
- 7.Wekhev, dijwateya tehil.
- 8.Meha rojiyê.